Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 483 7- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



# Bi hatina zivistanê tevger li sûka Minbicê zêde ye

**Bi hatina zivistanê û destpêkirina sermayê re li sûkên bajarên Bakurê Sûriyê liv û tevger zêde buye. Welatiyên Minbicê jî ji bo cilên zivistanê û sobeyan bikirrin berê xwe didin sûka bajêr. Welatiyan diyar kirin ku li gor salên berê îsal alav zêde ne û bihayê wan jî erzan e.**

Bi hatina zivistanê re bazarên bajarê Minbicê bi sobe û cilên zivistanê hatine dagirtin, di heman demê de tevgera welatiyan ji bo kirîna pêdiviyên demsala zivistanê zêde bûye.





Bi hatina demsala zivistanê re, welatiyên Minbicê amadekariya xwe ya pêşwazîkirina zivistanê dikin û pêdiviyên zivistanê dikirrin.

Li bajarê Minbicê gelek dikanên cilên zivistanê qumaşên rîs, betanî û cilên zivistanê difroşin. Her wiha li dikanan sobeyên cuda yên gaz û mazotê jî tên firotin.

Yek ji xwediyê dikanên firotina alavên germkirinê Hesen El-Ehmed wiha dibêje: “Me pêdiviyên yekem ji alavên germkirinê anîne û li gorî sala berê, îsal alav zêde ne.”

El-Ehmed wiha got, “Bi hatina zivistanê re daxwaza şêniyan ji bo alavên germkirinê zêde bibe, tabyet piştî ku baran barî ye.”

Gelek cureyên alavên germkirinê li sûkan tê firotin û li nirxê her cureyekê li gorî wê tê dayîn, îsal buhayê sobeyan di navbera 10 hezaran heta 40 hezaran lîreyê Sûriyê ye.

Derbarê mijarê de, xwediyê dikana firotina alavên germkirinê yên elktirîkê Cemîl El-Hîlal wiha got: “Hewa guherî û em ketin demsala zivistanê, welatî jî alavên germkirinê yên elktirîkê û yên mazotê dikirrin.”

Komîteya Sotemeniyê li bajarê Minbicê 51 hezar û 443 lître mazot li welatiyan belav kir û belavkirina mazotê heta niha dewam dike.

Welatiyê bi navê Ehmed Şeban jî axivî û diyar kir ku piştî barîna baranê wanmazot kirrî û wiha got: “Hemû pêdiviyên zivistanê li sûka Minbicê hene, çi ji cilên rîs û çi ji alavên germkirinê.”...*ANHA*

# Jınên Qamişlo Kilasîkoya Herêma Cizîrê sitandin



Ferîşte NEZÎR

Dîsa dewreya dawî bû pahra Yaneya Jinên Qamişlo û Ehlî Amûda. JI bo wê jî çavê yaneya Jinên Qamişlo li lîgeya nû ye, heycan û piştgirtiya cameweran dakete stadyomê, lê Jinên Ehlî Amûdê jî piştî ku kupeya Super girti bûn; ew jî bi wê hêrsa daketin stadyomê da ku Kupeyek din bistînin. Ku ev fîstîvala maçeya futbola jinan a kupeya Yaneya Herêma Cizîrê li ser stadyoma Ş.Heysem Kiço ya bajarê Qamişlo hate li darxistin.

**JİNÊN QAMİŞLO Bİ KED SER KETİN**

Jinên Yaneya Qamişlo di destpêka lîstikê de bi zext û hêz li himberî Jinên Ehlî Amûdê lîstin û baski li qalêciya wan kir, ku di encamê de lîstikavana Qamişlo ya bi navê Firyal Ehmed di demjimêra 15 ji werza yekemîn de golek li qaleya jinên Ehlî Amûdê anî; wiha bi golek bêyî bersiv dayîn werza yekemîn bi dawî bû. Di werza duyemîn a maça Kilsîko de, jinên Ehlî Amdî jî hewldan dan ku bersiv dibin û zextê ser lîstikvan û qeleya Jinên Qamişlo bikin, lê her lîstikvanê Qamişlo di milê parastinê de xurt bûn û maçe beyî ku Jinên Ehlî Amûdê beresiv bide bi dawî bû. Di encama vê heycan û lîstikê de Yaneya jinên Qamişlo bi goleke bêyî bersiv bi serket û Kupeya Yaneya Herêma Cizîrê ya Futbola jinan wergirt.

**YANEYA QENDÎL XELATA HÊZDAYÎN GİRT**

Di dawiya maçê de bi armanca hêzdayîn û bi boneya ku Jinên Yaneya Qendîl ev yekemîn car tevlî şampiyona fermî ya Herêma Cizîrê dibin, her wiha yekemîn yaneya jinê desturname girtiye ji hêla Desteya Ciwan û Werzîşê ya Herêma Cizîrê ve hatin xelat kirin. Piştre Kupeya şampiyonê radestî Jinên Qamişlo hate kirin, wiha kêliyên kêf û şehnaziyê belva dibûn.

Hêjayî bi bîrxistinê ku ev şampiyona ye di 26’ê Cotmehê de bi beşdarbûna 5 yaneyan wekî Jinên Qamişlo, Ehlî Amûdê, Serê Kaniyê, Biratî û Qendîl destpêkiri bû, ku heya niha yaneya Cûdî tenî di vê şampiyonê de hazir nebû. Yeneya Qamişlo Kupeya Ragihandina Rêveberiya Xweser, kupeya dewrî ya jinan a sala 2017’an û şampiyona çalakirinê ya sala 2018’an jî wer girtiye. Lê jinên Ehlî Amûdê Kupeya super wergirtiye û di dema niha de amdekariyên xwe yê derbsabûna qonaxa çûyîna ya dewreya 2018’an de dikin.

Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 483 7- Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Ji bo Rêber Apo her cihî veguherînin qada çalakiyan

Ji bo şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wê ji 6’ê vê mehê û pê ve li bajarê Strasboûrg ê Fransayê hin çalakî werin lidarxistin. Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê (TJK-E) daxuyaniyeke nivîskî weşand û ji bo çalakiyan banga tevlîbûneke xurt hate kirin.*R-3*

# BERXWEDAN Û WELATPARÊZÎ WÊ ÊRÎŞAN RAWESTÎNE

**Dewleta Tirk ya dagirker bi piştgiriya hêzên navnetewî û herêmî êrîşên xwe yên li ser axa Sûriyê didomîne. Bi taybet ji bo ku sîstema demokratîk ya li Bakurê Sûriyê ava buye têk bibe di nava hewldanên mezin de ye. gelên Bakurê Sûriyê jî li dijî van êrîşên dagirkeriyê bi hêrs in û dibêjin ku ew ê li ber xwe bidin û dest ji axa xwe bernadin.**



### WÊ PLANÊN TIRKIYÊ TÊK BIÇIN

Nerazîbûnên li dijî êrîşên dewleta Tirk ya dagirker a li dijî Bakurê Sûriyê zêde dibin. Welatiyên Efrîn û Şehbayê êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Kobanê û Girê Spî şermezar kirin û diyar kirin ku bi ruhê Berxwedana Serdemê ew ê hemû êrîş û planên qirêj yên dewleta Tirk werin pûç kirin. Welatiyan wiha gotin, “Tirkiyê çi dike bila bike, nikare Kurdan tune bike. Gelên Sûriyê ti êrîşên dagirkeriyê qebûl nakin. Bila hêzên navnetewî jî li hember van êrîşan helwestê nîşan bidin.” *R-5*

### DIVÊ GELÊN SURIYÊ BIBIN YEK


Nivîskarê rojnameya me Zekî Bedran jî di nivîsa xwe ya vê hefteyê de bi van gotinan bal kişand li ser êrîşên dewleta Tirk, “Ji bo Bakurê Sûriyê tevlihev bikin û bingeha dagirkirinê ava bikin di serî de Tirkiye hinek hêzan lez dane xebatên xwe. Divê gelên Sûriyê bibin yek, di eksena berxwedanê de axa xwe û destketiyên xwe biparêzin.Tirkiye wê hewl bide êrîş bike û dagirkeriyê berfireh bike. Yekemîn sekna ku dagirkeran rawestîne welatparêzî û berxwedane.” *R-4*

## Armanc ji kuştina El-Hiwêdî derxistina fitnê ye



Şêx û rûspiyên her du eşîrên El-Sebxa û El-Bosbêh ên Reqayê li Navenda Têkliyên Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk di derbarê kuştina şêxê eşîra El-Efadlê Beşîr Feysel El-Hiwêdî de daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de hat gotin ku armanca kuştina El Hiwêdî li herêmê derxistina fitne û tevliheviyê ye. *R-5*

## Pêwîste Kongreya Netewî bê lidarxistin



Nîqaş û nirxandinên li ser pêwîstiya lidarxistina kongreya netewî ya kurd berdewam dikin. Endamê rêveberiya YNK’ê Aras Abdula û Parlamenterê Tevgera Goran diyar kirin ku pêwîste kongreya netewî were lidarxistin û dan zanîn ku ev mijar gelek dereng maye û divê stratejiyeke netewî ya hevpar bê danîn. *R-4*

## Tirkiye bi hêza civîna Stenbolê êrîşî Rojava dike




Kongreya Civaka Demokratîk HDK’ê encamnameya Civîna Meclîsa Giştî bi raya giştî re parve kir. HDK’ê di encamnameyê de bertek nîşanî êrîşên Tirkiyê yên li ser Bakurê Sûriyê da û got: “AKP îdia dike ku bi armanca rizgarkirina sivîlan Idlib dagir kiriye û li aliye din bi hêza ji civîna çar alî ya li Stenbolê girtiye êrişî Rojava dike.” *R-4*

## Ciwanan xwestin tecrîda li ser Ocalan were rakirin *R-2*

## Ber bi tifaqa Êzidiyan ve gaveke girîng

Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê ji bo tifaqa Êzidiyan pêk bîne û xwe bixwe birêve bibe, civîneke girîng li Şengalê lidarxist. Di civînê de, di mijara tifaqa navbera Êzidiyan, xwe bi xwe birêvebirina civaka Şengalê de gelek biryarên girîng hatin girtin. Di dawiya civînê de daxuyaniyek hat dayîn û bang li hikûmeta Iraqê û hikûmeta Başûrê Kurdistanê hat kirin rêzê bidin îradeya gelê Êzîdî. *R-4*



## Li Şehbayê Navenda Yekîtiya Êzidiyan hat vekirin

Li herêma Şehbayê Navenda Yekîtiya Êzidiyan hat vekirin. Rêvebera Yekîtiya Jinên Êzidî ya Navçeya Tel Rifetê ya Şehbayê Henan Nasro di derbarê vekirina Mala Êzidiyan a li Şehbayê de axivî û got: “Tevî hemû zehmetiyan em teslîm nebûn û em têkoşîna xwe didomînin.” Henan banga min li hemû Êzidiyan kir ku bibin yek. *R-2*

## Civaka Îslamî ya Kurdistanê azadiya Ocalan xwest

Civaka Îslamî ya Kurdistanê kongreya xwe di navbera 2-4’ê Mijdarê de li Elmanyayê li dar xist. CÎK’ê di kongreyê de gelek biryar girt û her wiha Îslamiyeta ku Siûdî, Îran, Tirkiye û DAÎŞ ferz dikin, red kir. CÎK’ê tecrîdkirina Rêber Ocalan şermezar kir û daxwaza azadiya wî kir. Di kongreyê de ji bo azadiya gelê Kurdistanê, soza têkoşînê hate dayin. *R-6*

## Ji bo piştgiriya Efrînê şev hat lidarxistin

Li bajarê Elmanya Frankfûrtê ji bo Pêngava Azadkirina Efrînê şeva piştgiriyê hate lidarxistin. ji gelek bajarên Elmanya bi sedan Kurdistanî beşdarî şevê bûn. Di şevê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ji bo piştgiriya Pêngava Azadkirina Efrînê ew hatine ba hev. Hat gotin, yên ku ji destkeftiyên gelê Kurd aciz bûne, êrîşî Rojava dikin. *R-2*

## Em ê serê xwe li ber êrîşan netewînin

Yekîtiya Ciwanên Rojava YCR`ê bi armanca şermezarkirina êrîşên dewleta tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê li navçeya Şêranê ya Kobanê meşek li dar xist. Bi sedan ciwan tev li meşê bûn. Ciwanên ku tevlî meşê bûn diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li dijî êrîşan bisekinin û tekoşîna xwe bilind bikin. *R-2*

## Em ê ambargoya DYA’yê têk bibin

Pakêta duyemîn a pêkanînên DYA’yê yên li ser Îranê roja 6’ê mehê kete dewrê. Piştî ku pêkanînên DYA’yê yên li ser Îranê ketin meriyetê, Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî daxuyaniyek da. Rûhanî got, “Amerîka dixwaze petrol ji Îranê neyê firotin. Lê em ê petrola xwe bifiroşin û ambargoyê têk bibin.” *R-2*

# Em ê serê xwe li ber êrîşan netewînin

**Yekîtiya Ciwanên Rojava YCR`ê bi armanca şermezarkirina êrîşên dewleta tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê li navçeya Şêranê ya Kobanê meşek li dar xist. Bi sedan ciwan tev li meşê bûn. Ciwanên ku tevlî meşê bûn diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li dijî êrîşan bisekinin û tekoşîna xwe bilind bikin.**




YCR'ê bi armanca şermezarkrina êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser Kobanê û Girê Spî meşek li navçeya Şêranê ya Kobanê li dar xistin. Yekîtiya Ciwanên Rojava YCR`ê bi armanca şermezarkirina êrîşên dewleta tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê meşek li dar xist. Bi sedan ciwan tev li meşê bûn.

Ciwanên ku tevlî meşê bûn diyar kirin ku ew êrîşên êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê û hedefgirina sivîlan şermezar dikin û dan zanîn ewê heta dawiyê li dijî êrîşan bisekinin. Ciwanan dan zanîn ku ew ê ji bo azadiya welat û zarokan heta dawiyê li ber xwe bidin û tu carî serî ji êrîşên dijminan re netewînin.

## Ji bo piştgiriya Efrînê şev hat lidarxistin

Li Frankfûrtê ji bo Pêngava Azadkirina Efrînê şeva piştgiriyê hate lidarxistin.



Li bajarê Frankfûrtê yê Elmanyayê bi pêşengiya NCDK a Frankfûrtê bi şîara 'Şeva Piştgiriyê ya ji bo Azadkirina Efrînê' çalakiyek hate kirin. Bi sedan Kurdistanî tevlî şevê bûn.

Koma Şanoyê ya Zarokan a Hanaûyê jî govendên herêma Botan û Amedê pêşkêş kirin.

Di şevê de li ser navê KCDK-E'yê Yilmaz Kobanê axivî. Kobanê got, "Ji bo piştgiriya Pêngava Azadkirina Efrînê em hatine ba hev. Yên ku ji destkeftiyên gelê Kurd aciz bûne, îro êrîşî Rojava dikin. Li ser Rêbertiya me tecrîdeke giran heye. Ji bo şikandina tecrîdê divê her kes tevlî vê pêngavê bibe ya ku Tevgera Azadiyê ya Kurdan daye destpêkirin."

Di şevê de Xelîl Xemgîn, Hozan Mizgîn, Ergîn Xelikan, Sena Dersimî, Hozan Metîn û koma Rapê ya bi Kurdî Freefîghter derketin ser dikê.

## Em ê ambargoya DYA'yê têk bibin



Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî diyar kir ku, wê ambargoya DYA'yê têk bibin.

Piştî ku pêkanînên DYA'yê yên li ser Îranê ketin meriyetê, Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî daxuyaniyek da.

Rûhanî got, "Amerîka dixwaze petrol ji Îranê neyê firotin. Lê em ê petrola xwe bifiroşin û ambargoyê têk bibin."

Rûhanî got, "Ev yek şerekî aborî ye li dijî Îranê, lê belê divê Amerîka fêhm bike ku li dijî Îranê nikare zimanê hêzê bi kar bîne." Rûhanî diyar kir ku ew amade ne li dijî her şêwe zextan li ber xwe bidin.

Pakêta duyemîn a pêkanînên DYA'yê yên li ser Îranê roja 6'ê mehê ketibû dewrê.

## Ciwanan xwestin tecrîda li ser Ocalan were rakirin



Ciwanên Kurd li ber Muzeya Loûvre ya li Parîsê û li mezintirîn gara trenê ya vî bajarî çalakiyek li dar xistin. Ciwanan xwestin tecrîda li Îmraliyê were rakirin.

Ciwanên ji Tevgera Ciwanên Şoreşger YXK û JXK'ê, li Gare du Nord a li paytexta Fransa Parîsê çalakiyek pêk anîn.

Ji bo balê bikişînin ser tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ciwanan posterekî mezin ê Ocalan, alên PKK û KCK'ê û wêneyên sê jinên şoreşger ên Kurd ên sala 2013'an li Parîsê hatin qetilkirin, vekirin.

Her wiha pankarta bi nivîsa "Dewleta Tirk a faşîst ji Kurdistanê bicehime" ya bi zimanê Fransî hildan.

Ciwanan ji bo azadiya Ocalan û şermezarikrina dewleta Tirk a faşîst dirûşme qîriyan.

Endamên rêxistinên ciwanan li ber Muzeya Loûvre ya navdar li hev civiyan û tecrîd şermezarkirin. Ciwan li pêşiya muzeyê rûniştin û dest bi xwendina pirtûkên Ocalan kirin.

Ciwanan her wiha li ser tecrîdê û êrîşên dewleta Tirk belavok belav kirin.

## Gelên Sûriyê wê li dijî êrîşan li berxwe bidin

Gelê Dêrazorê li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmên Bakurê Sûriyê çalakiyek li dar xistin û piştgiriya xwe bi QSD'ê re anî ziman.

Bi sedan welatiyên gundên rojayê Dêrazorê, tevlî endam û rêveberên Meclisa Sivîl a Dêrazorê, meclis û saziyên herêmê li dijî dagirkeriya Tirkiyê çalakiyekli bajarokê Kesra û Cezrayê li dar xistin.

Di çalakiya li bajarokê Cezrayê bi navê komîn û meclisan daxuyanî ji aliyê Casim El-Tebaş ve hate xwendin.

Casim El-Tebaş êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmên Bakurê Sûriyê şermezar kir û ku gelê Bakurê Sûriyê wê berxwedana xwe ya li hemberî êrîşan berdewam bikin.Bi navê Rêveberiya Sivîl a Demokaratîk a Dêrazorê Hevserokê Meclisa Zagonsaz Merwan Fiteyih daxuyanî xwend û diyar kir Tirkiyê bi van êrîşên xwe dixwaze zexta li ser DAIŞ'ê sivik bike…

*ANHA*

## Li Şehbayê Navenda Yekîtiya Êzidiyan hat vekirin



Li Şehbayê Navenda Yekîtiya Êzidiyan vebû. Rêvebera Yekîtiya Jinên Êzidî ya Navçeya Tel Rifetê ya Şehbayê Henen Nasro di derbarê vekirina Mala Êzidiyan a li Navçeyê Şehbayê de axivî û got: "Tevî hemû zehmetiyan em teslîm nebûn û em têkoşîna xwe didomînin."

Li Navçeya Tel Rihefta Şehbayê Navenda Yekîtiya Êzidiyan vebû. Rêvebera Yekîtiya Jinên Êzidî ya Navçeya Tel Rifetê ya Kantona Şehbayê Henen Nasro di derbarê vekirina Mala Êzidiyan a li Navçeyê Şehbayê got: "Em wekî jinên Kurd tu carî serî li dijî zordestiyê natewînin û em ê her li berxwe bidin. Ji bo rêxistinbûyinê û pêşketina xebatan Navendê Yekîtiya Jinên Êzidî gelek girîng e."

Henan diyar kir ku jinên Êzidî bi zehmetiyên mezin rû bi rû hatin hiştin lê wan serî netewandin û wiha dewam kir, "Dewleta tirk xwest ku îradeya gelan bişkîne lê negihişt armanca xwe. Ji bo Êzidî xwe û dîroka xwe nas bikin ev navend gavek girîng e. Li vir wê perwerde bê dayin. Êzidî heta dawî wê xwedî li çand, ol û dîroka xwe derkeve. Banga min li hemû Êzidiyan ew e ku bibin yek û bi hevre li dijî hovîtiya dagirkeran têbikoşin."



# Serî hildin Efrîn li benda me ye

***Mîhrîcana Dengvedana Efrînê bi dirûşmeya 'Ciwanên şoreşger û gelê niştîmanperwer serî hildin, Efrîn li benda me ye' ji aliyê Yekitiya Ciwanên Rojava û Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk ve hate lidarxistin û 4 rojan berdewam kir. Ciwanên ku beşdarî mihrîcanê bûn diyar kirin ew ê çalakiyên het rizgarkirina Efrînê berdewam bikin.***





**Idrîs HENAN**

Di çarçoveya Festîvala Gelan a Şehîd Hogir a Ciwanan de, li Herêma Efrînê Mihrîcana Ciwanan a Dengvedana Efrînê di 2 Mijdarê de li dar ket. Yekemîn roja mihrîcanê li navçeya Şêrawa a girêdayî Kantona Efrînê bû. Roja duyemîn li navçeya Erfadê, roja sêyemîn li gundê Babins, roja dawî jî wê li wargeha berxwedana gelê Efrînê li Kampa Berxwedan be.

### CIWAN WÊ TOLÊ HILDIN

Endamê Tevgera Ciwanan Tolhildan Zeredeşt di vê derbarê de ji rojnameya me re axivî û ev tişt anî ziman: Ev mehrîcan berdewamiya duyemîn qonaxa hemleya ciwanan a Serî Hilde ye. Zeredeşt diyar kir ku mehrîcana Dengvedana Efrînê wê tenê di çarçoveya her çar rojên fermî de kilîtkirî nemîne û ev axaftin kir: Em ê çalakiya xwe heya rizgarkirina Efrînê dewam bikin. Çawa ku pêlên dagirkeriya bi ser Kurdan ve xilas nabin, wê berxwedana gelan jî ya bi pêşengtiya ciwanan bi dawî nebe. Zeredeşt helwesta ciwanan beramberî êrişên dewleta Tirk ên bi ser Herêma Federal a Firatê ve bi van gotinan vegot: Çawa li Efrînê kirin dixwazin li aliyê Kobanê û Girê Spî jî bikin. Lê em ê bi ruhê ciwanan tola gelê xwe ji hemû dagirker û neyaran rakin.

### ZEYTÛN KOKA CIWANTIYÊ YE

Narman Îbrahîm Endama Rêveberiya Tervgera Ciwanan li navçeya Şêrawa derbarê çalakiya darçandinê de got: Ji ber ku Şêrawa parçeyekî Efrînê ye, gelekî girîng bû ku roja yekemîn li wir bê lidarxistin. Dîsa li hemberî kiryarên dewleta Tirk ên qutkirin û şewitandina darên zeytûnan, me di vê rojê de bi sedan darên zeytûnan çandin. Dara zeytûnê koka ciwantiya gelê Efrînê ye. Wê berxwedana gelê Efrînê bi çandina daran zindî bimîne.

### EFRÎN GORISTANA NEYARAN E

Ciwanê şoreşger Mihemed Elî Reşîd ku li mehrîcanê amade bû got: Gelê Kurd gelekî bi kok e. Her afrîner û xiluqkar e. Wê ciwan bi ruhê lidrxistina Mehrîcana Dengvedana Efrînê û çalakiyên xwe yên bênavber Efrînê ji neyaran re bikin goristan.

### MEHRÎCAN VEGOTINA BERXWEDANÊ YE

Zêneb Hemo Endama ciwanan di Meclîsa Kantona Efrînê de derbarê lidarxistina mehrîcana Dengvedana Efrînê de ev tişt ji rojnameya re got: Mehrîcan di bin diruşmeya "Ey ciwanên şoreşger, ey gelê welatprêz serî hildin Efrîn li benda me ye" tê lidarxistin. Hemo destnîşan kir ku niha li aliyê Herêma Federal a Cizîrê Mehrîcana Gelan a Şehîd Hogir tê lidarxistin, lê ji ber nebûna derfetan û dorpêça li ser gelê Efrînê, dewama wê bi navê Dengvedana Efrînê li Efrîn û Şehbayê tê lidarxistin. Hemo diyar kir mehrîcan wê çar rojan li Şêrawa, Erfad, Babins û Kampa Berxwedan bê lidarxistin. Çalakiyên mehrîcanê "axaftin, çandina darên zeytûnan, şano, govend, spor, pêşbirkên zanyarî, stran, helbestên bi zimanê Erebî, pêşbirkên xwarinê,… hwd" çarçoveya vegotina berxwedana gelê Efrînê de ne. Endama Ciwanan di Meclîsa Kantona Efrînê de Zêneb Hemo di dawiyê de got: Armanca me ya sereke ji mehrîcanê; bi ruhê ciwanan tekezkirina sekna berxwedêr a gelên Efrîn, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye.

## Fîlma "Keçên Rojê" li Cenevreyê hat nîşandan

Fîlmê Keçên Rojê ku qala berxwedana jinên Kurd dike li Cenevreyê hate nîşandan. Eleqeyek mezin ji bo fîlmê hate nîşandan û derhêner Hûsson wiha got; "Dirûşmeya jin, jiyan, azadî nîşaneya têkoşîna hevpar û azadiya jinên cîhanê dide nîşandan."

Fîlmê Les Fîlles du Soleil (Keçên Rojê) di 24'emîn Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Cenevre hate nîşandan ku qala berxwedana li Şengal û Rojava ya jinên Kurd a li dijî çeteyên DAÎŞ'ê dike. Derhênera wê jî wê Eva Hûsson a Fransiz e.

24'emîn Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Cenevre 2'ê Mijdarê dest pê kir. Roja Şemiyê li sînemaya Empîr Fîlmê Keçên Rojê hate nîşandan û temaşevenan eleqeyek mezin nîşanî fîlm dan. Piştî fîlm bi dawî bû li salonê dirûşmeya "Jin, Jiyan, Azadî" hate berzkirin.


### MIN XWEST BERXWEDANÊ RAGIHÎNIM

Dêrhênera fîlmê Eva Hûssan piştî nîşandana fîlm bi temaşevanan re rûnişt û pirsên temaşevanan bersivand. Hûssan got; "Ji bo ragihandina berxwedana jinên Kurd ji bo cîhanê min ev fîlm kişand. Beşdariya jinên Kurd ji bo têkoşînê gelekî mezin e."

Hûsson diyar kir fîlm qala doza Kurd nake lê qala têkoşîna jinên Kurd dike û wiha dewam kir; "Dirûşmeya jin, jiyan, azadî ya ku bûye nîşaneya jinên Kurd ne tenê sembola jinên Kurd e, nîşaneya têkoşîna hevpar û azadiya jinên cîhanê ye. Dirûşme di heman demê de sembola felsefeya Ocalan û YPJ'ê ye ya ku dixwaze civakekê ava bike."



Hûsson herî dawî diyar kir ku yek ji armancên kişandina fîlm vegotina rastiyan e, yên ku hatine jiyîn.



## Hunermend û Ziman

**Hozan SEYÎDXAN**



Tevgera tasfiye yê a ku di serdema împaratoriya osmaniyan de li dijî otorîte ya Qabîle, Eşîret û bawermendên Kurdistanê dihate birêvebirin, di heman demê da ev tevger, tevgera qirkirin û tasfiye- kirina rastiya ziman û çanda kurd bû. Faşizma Tirkê sipî hîna di pêvajoya sereteyî ya avakirina komara xwe de, bi va polîtika ya tasfiyekirinê bi ser nirxên çandê yên kurdan de çûne.

Piştî hewqas sal îro AKP eynî mîna bav û kalên xwe û dibin mercên herî girande,tasfiye ya rastiya kurd û tevgera azadiyê xistiye rojeva xwe.

Bi kurtî, va hersê akimê Tirkperest (Netewperesti ya tirkê siyonîst, Nijadperestê tirkê irqçî û nîjadperestên îslama Tirk) di çarçove ya yek xala hevpar de, qirkirina ziman û çanda kurd di menzîla wan de bû ye. Her çiqasî ev hersê nîjadperest li ser gelek mijaran li dij hev û di, tekoşînên bi xwîn dabin jî, di her sedemê de helwesta wan li dijî kurdatiyê yek bû ye. Belê îro, tehlîke ya li ser ziman û çanda kurd berdewa me. Heta dikare bê gotin dewleta dagirker ya tirk ziman û çanda kurd aniye ber mirinê. Başe, hunermendên kurd bi kîjan hişmendiyê xweditiyê li zimanê xwe dikin? Çiqasî bi hilberîn û berhemên xwe xizmeta zima nê xwe dikin? Di çalakî û şahiyên çandê da kîjan zimanî bikar tênin? Li aliyên din li hemberî asîmîlasyona ku bûye weke pençeşêreke civakî çiqasî feryada gelê kurd digihînin raya giştî û mirovên xwedî wijdan.

Gotinek heye tê gotin "Wexta mirov ji axa xwe bi dûr dikeve, rihê wî pir li ber ba dimîne" Tevgera azadiyê da kû rihê me tenê li ber ba nemîne, di tekoşîna 40 salan de raman, zanist bi destmeve anî. Vîna me qewîn kir. Bi me re, vegera welat û hiskirina azadiyê çêkir. Û îro bi saya destkeftiyên vê dozê bun hunermend, bûn zimanzan, rewşenbîr û gelek pişeyên din.

Di çavê gel de hunermend ew kesên zane, hişmendar, têgihiştî, hilbijêre û ronakbire. Ji dirokê, zanistê agahdare, di karê hunerîde afirînere. Ji hemû pirsgirêkên civakî û siyasî agahdare, hunera xwe li ser van xalên bingehîn avadike. Ango çêdike.

Berê hunermend li min biburîn, ezê du- sê çavdêriyan parve bikim. Dibêjin hunermendên kurd baş ziman nizanin, zanebûna wan ya entelektuelî qelse, xwe ji siyasetê bidûrdixin, xwe ji afirandin a hunerê ya ji bo şoreşê bi sînor dikin. Hemû meyla xwe didine çalakiyên civakê yên wek dawetan. Wekû şaîre kurd Arjên Arîn dibêje,"zimanê we şal û şapikê we ye. Bila hertim li we be." Helbet ziman ji bo her kesî giringe. Ya herî giring xwendin, axaftin û nivîsandina bi kurdî ye.

Ji ber van egeran, pêşxistina zimanê kurdî erkekî sereke yê hunermenda ye.

Hunermend di rabûn, runiştinê de di hemû kêliyên jiyanê de, di kar û xebatê de, di afirandina stranan de bi zimanek şêrîn, xweş , bi bandor difikire, diaxife û dibêje.

Wek hemû bîrên civakê hunermend jî rola xwe ya ji bo pêşxistin û parastina ziman baş bilîze, ew ê hunera ronakbirî jî pêş bikeve. Wê di helbest û stranan de zelalî derkeve pêş .

Ez bi rê ya van çend rêze nivîsan temeniyên xwe û tişta min ji civakê bihîstine dinivsînim. Qirkirin tenê buyerek fizîkî nîne. Ji bîr û hizrê dûrxistin, ji kok û rastiyê bi dûrxistin ya herî xerabe. Ew kesên ne di zanebûna vê heqîqetê de be, wê nizanibe ka kîye û ji kuye..

Ji bo pêşî li qirkirinên siyasî û çandî bê girtin, pêdivî bi tekoşîna ronakkirinê heye. Ên vê tekoşînê birêve bibe hunermendin, rewşenbîrin. Helbet parastina ziman û nirxên çandê giringe, lê jiyîn û jindarkirin hîn girîngtire.

Li herderê welat agir bi ser gel û nirxên gel de dibare, cardin dewleta tirk êrîşî Kobanê û bakurê rojava dike. Di pêvajoyek hewqas giran de, xwedîtî li ziman û çandê kirin erkekî pîroze.

# Alîkarî li kampa Ebû Xeşeb hat belavkirin

**Li kampa koçberan a Ebû Xeşeb a li Dêrazorê bi hezaran koçberên ku ji ber şer reviyane dimînin. Koçber di bin şertên zehmet de dijîn. Bi hatina zivistanê re Komseriya Netewên Yekbûyî bi hevkariya Meclisa Sivîl a Dêrazorê 500 çadir li koçberên kampa belav kir.**

Bi hatina zivistanê re Komseriya Netewên Yekbûyî bi hevkariya Meclisa Sivîl a Dêrazorê 500 çadir li koçberên kampa Ebû Xeşeb a gundewarên rojavayê Dêrazorê belav kir.



Piştî barana dijwar ku di hefteya derbasbûyê de li herêmê barî û di encama wê de gelek çadirên kampa Ebû Xeşeb xira bûn. Meclisa Sivîl a Dêrazorê û komîteyên wê bi rêxistinên karûbarên koçberan re ketin nava têkiliyan da ku çadiran ji kampê re peyde bikin.

Komseriya NY`yê bi hevkariya Meclisa Sivîl a Dêrazorê li şûna çadirên kevin û yên ji ber baranê rizyane çadirên nû li koçberan belav kirin.

Her wiha ji ber barana zêde zimhêr xira bûn koçberên li kampê bê xwarin û av man. Ji ber vê jî zehmetiyên koçberan zêde bûn. Gelek kesên nexweş jî ji ber zehmetiya di çûn û hatinê de bi gelek astengiyan re rû bi rû dimînin.

Piştî van zehmetî û pêwistiyan Meclisa Sivîl a Dêrazorê bang li rêxistinan kir ku alîkariya wan bikin. Li ser vê banga meclîsê Komseriya NY`yê 500 çadirên nû, pêwîstiyên xwarinê, li koçberan belav kir…*ANHA*

# Civaka Îslamî ya Kurdistanê azadiya Ocalan xwest

Civaka Îslamî ya Kurdistanê li Elmanyayê kongreya xwe pêk anî û ji kapîtalîzmê heta pirsgirêkên jinan û ekolojiyê gelek biryarên balkêş girt. CÎK'ê Îslamiyeta ku Siûdî, Îran, Tirkiye û DAÎŞ ferz dikin, red kir.

Tevgera Îslamî ya Kurdistanê ku sala 1993'an li çiyayên Kurdistanê ji aliyê seydayên Kurd ve hate avakirin, navê xwe guherand û kir Civaka Îslamî ya Kurdistanê. Kongreya herî dawî ya Civaka Îslamî ya Kurdistanê di navbera 2-4'ê Mijdarê de pêk hat.

Di kongreyê de bûyer û guhertinên li Rojhilata Navîn û Kurdistanê hatin nirxandin û ev tespît hate kirin: "Li ser mîrateya berê, li gorî şert û mercên nû em neçar in hem bi rengekî dînî hem jî neteweyî vê pêvajoya dîrokî pêşwazî bikin."

Di kongreyê de ji bo azadiya gelê Kurdistanê, ji bo pêşîgirtina li rejîmên zalim û zordar soza têkoşînê hate dayin.

Civaka Îslamî ya Kurdistanê, pîvanên gerdûnî, mafên mirovan, demokrasî û azadî weke 'cewhera' Îslamê û olên din pênase kir û diyar kir ku wê van nirxan derxînin pêş. Ji azadiya civakî heta mijarên ekolojî, azadiya jinê û têkoşîna li dijî kapîtalîzmê gelek tespît hatin kirin.

Di kongreyê de ji bo serdema ji pêxemberê Îslamê Mûhhamed heta wefata Xelîfe Elî, weke "Pêvajoyeke ku Îslama demokratîk, azadîparêz, wekhev, edaleta civakî, ekolojîst û exlaqî lê serdest bû" hate pênasekirin. Pêvajoya ku bi Emewiyan re dest pê kir weke dema feraseta kolekirin, cariyekirin, zayendîperestî, cihêkirina çînî, kabîletî, nîjadperestî û desthilatdarparêzî hate binavkirin û hate gotin, ev xet niha bi feraseta DAÎŞ û AKP'ê dewam dike.

Civaka Îslamî ya Kurdistanê diyar kir, ev rê û rêbazên bi navê ol hatin bikaranîn, ji bilî rijandina xwînê, rondikên çavan û hilweşînê tiştek ji bo erdnîgariya Misilmanan neaniye.

## PEYMANA MEDÎNE

Di kongreyê de hate ragihandin ku li dijî vê ferasetê ew Peymana Medîne esas digirin û li dijî tekperestiyê ew pirrengiyê dixwazin. Hate gotin, Peymana Medîne weke tecrûbeya jiyana bi hev re, modeleke di ser serdemê re ye.

Civaka Îslamî ya Kurdistanê diyar kir, bi esasgirtina vê peymanê re divê pirsgirêka Kurd û pirsgirêkên din ên civakî werin çareserkirin û ji bo aştiyê bang kir.

Di kongreyê de, kes û hêzên bi navê Îslamê mirovên sivîl û bê guneh dikujin, weke dijber û dijminê Îslamê hatin binavkirin û ev feraset û helwesta wan bi tundî hate şermezarkirin.

Civakê destnîşan kir ku li gorî feraseta wan, bawerî û olên cuda divê karibin bi rengekî azad bijîn. Di encamnameyê de hate gotin, "Civaka Îslamî ya Kurdistanê serjêkirina mirovan, birîna daran, talankirina xweza û dîrokê, hilweşandina îbadetxaneyan û kabrîstanê ku bi navê Îslamê tên kirin, red dike."

## MAFÊN JINAN

Wekî din hate gotin, Civaka Îslamî ya Kurdistanê bi her awayî nîjadperestî û asîmîlasyonê re dike û li ber otoasîmîlasyonê radibe. Di kongreyê de hate diyarikrin, ew perwerdeya bi zimanê dayikê yê Kurdî diparêzin û di mijar mafên jinan de jî nirxandinên girîng hatin kirin.

Di encamnayê de hate gotin, "Mixabin li nava alema Îslamê tê dîtin ku şîdeta li jinê tê kirin gelekî giran e: mafên jinan ji aliyê zîhniyeta mêr, serdest û desthilatdarîparêz ve tên binpêkirin. Civaka Îslamî ya Kurdistanê j ialiyê maf, wezîfe û berpirsyariyê ve jin û mêran weke parçeyên wekhev ên heman hevgirtinê ne, têkoşîna jinê jî weke qada herî girîng a têkoşînê dibîne."

## HEVSENGIYA EKOLOJÎK

Di kongreyê de hate destnîşankirin ku Civaka Îslamî ya Kurdistanê "hevsengiya ekolojîk" girîng dibîne û diparêze. Di vê mijarê de jî Peymana Medîneyê referans dibîne.

## DAXWAZA AZADIYA OCALAN HATE KIRIN

Civaka Îslamî ya Kurdistanê her wiha tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û daxwaza azadiya wî kir. Alêm Kurd herî dawî bang li seyda, şêx û seyîdên li Kurdistanê kir ku xwe nêzî Erdogan ê zalim nekin, lê xwedî li gelê Kurd ê mezlûm derkevin.

# Rêya gundê Girkê Mîro hate çêkirin

Li ser daxwaza welatiyan, Şaredariya Gel a gundê Robariya rêya Girkê Mîro çêkir.

Komîna gundê Girkê Mîro ya girêdayî herêma Dêrîkê ji Şaredariya Gel xwest ku rêya gund sererast bikin da ku tevgera çûn û hatina li gund hêsan bibe û ji bo ku welatî zivistanê zehmetiyan nekişînin.

Şaredariya Gel li gundê Robariya ya girêdayî herêma Dêrîkê dest bi projeya sererastkirina rêya gund a ku dirêjiya wê 3 km û firehbûna wê 6 metreye kiriye.

Hevserokê Şaredariya Robariya Ibrahîm Osman destnîşan kir ku, proje li ser du qonaxan hatiye destpêkir û wiha got: "Qonaxa yekemîn qeşartina rêye û ya duyemîn jî bermahiyên kevirên hûr li ser rêyê raxistine. Ew rê xizmeta 5 gundan dike."

Endama Komîna gund Gulistan Mîro li ser pêkanîna projeyê spasiya Şaredariya Robariya kir. Gulistan da zanîn ku, ev proje bi hevkariya di navbera Şaredariya Gel û komîna gund pêk hat û wiha got, "Me serdana rêya ku hatiye çêkirin kir û rê baş hatiye çêkirin."

Gulistan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Pêkanîna projeyê wê zehmetiyên ku welatî di demsala zivistanê de dibînin, kêm bike."…*ANHA*



# Gelê Salibandî



Medeni FERHO

Selibandin, çarmixkirin e!... Kurd her du gotinan bikartînin, di wateya dardekirina Cn. Îsa de ye. Suryanî "silîbo" bi kar tînin, Tirkan ji Kurdan dizîye, çarmix bikartînin. Çarmix, ji çar bizmarên çar parsuyî ku li dest û lingên Cn. Isa dane tê... Gelê Kurd, sed sal in tê salibandin. Tecrîd jî, salibandin e!...

Waliyê Roma, Cn. Îsa li Girê Golgata saliband. Mesîhiyên li Mezopotamya, ji wê rojê û heta îro, ji salibandinê rizgar nebûne. Roma, rengê salibandinê kirin al û li serê girê Golgata jî dêr çêkirin. Bêbextiya cîhanê!...

Roma, şargirtên Cn. Îsa avêtin ber şêran, piştre jî di şerê Xaçparêziyê de, ji bo bizmarên li dest û lingên Cn. Isa dan û darên li ser salibandin, geriyan. Mirov, şîrê xaf mihtiye û bêbext e.

Gelê Kurd jî, sed sal in tê salibandin.

Di her bexwedana Kurdan de, hêzên Tirk, herêm dorpêç kirine, tecrîd û îzole kirine û tune kirine.

Îro jî tecrîda li Imralî, îzolekirin e!... Haraketa Kurd jî, ji bilî Kurdistanê li ti deverên cîhanê têkoşîna çekdarî nekiriye, dîse jî bi navê terorê tê salibandin.

Di salibandina Cn. Îsa de, cîhan li dora Roma zalim dizîvîrî; di tecrîda li ser Birêz Ocalan de, di terorîzekirina Haraketa Azadiya Kurd de jî, cîhan li dora Tirk-î îslama zalim dizîvire.

Îro jî, gefên dagirkirina Rojhilatê Firatê û Rojava li Kurdan dixwin..

Îro jî, li sinorê Kobanê (di 1ê Mijdarê, Roja Kobanê ya Cîhan) êrîşî Girê Spî, Koban û gundên derdora wê kirin.

Êrîş, di dema ku hêzên QSDê çeteyên DAIŞê, li baregeha dawî dorpêç kirin û ew gihandibûn ber tunekirinê, bi fermana waliyê faşîzmê Tayyip Erdogan, hêzên Artêşa Tirk ya dewşîrme, êrîş kirin, keça 6 salî û 2 ciwan kuştin.

Waliyê faşîzmê Tayyip Erdogan, xwedî bedcanekî ku têkiliya wî bi gotinên modern re nîne. Modernîte bi ademiyetê re têkildar e û xwedî "canê epîk e", mixabin Erdogan, ji "canê epîk" dûr e. Wek şagirtê Ehreman maceraperestek e û xwedî mêjiyekî "hebîs ur" e.

Erdogan, dixwaze cîhaneke çeteyan ava bike; ev tê wateya ku li dijî nirxên pîroz yên olî û ademî şer dike; wek Waliyê Roma, ku di dema Cn. Îsa li çarmixê da, Xwedayê Mezin ji rûerdê da revandin, Erdogan jî, bi çarmixkirina Kurdan dixwaze Xwedayê Mezin ji rûerdê bidê revandin. Bi vî rengî dixwaze destanekî nû yê Humbaba binivîse.

Çeteyên DAIŞê, El Nusra û hwd. di destên Erdogan de bûne tevrê Humbaba!... Bi vî rengî dixwaze di sedsala bîstûyekê de, Kurdan li çarmixê bide. Birêz Ocalan li Îmralî, bi dopêçek polayî tecrîd kiriye; bi bombardumana her roj ya li Çiyayên Kurdistanê, dixwaze Haraketa Azadiya Kurd li çarmixê bide; Bakûr û Başûr salibandiye, berê xwe daye Rojava û Ewropa!...

Efrîn kiriye Riya Appia, li her derê darên çarmixê rêz kirine, dixwaze êrîşî Bakurê Suriye û Rojava teva bike. Li Ewropa jî, dixwaze rojnamevan, siyasetmedar, nivîskar, rewşenbîrên Kurd li çarmixê bide.

Cîhan, xeta navbera modern û kalsîk, serguzeşt-macerayên Don Quishot nîşan dide. Di serdema me de ev xet hatiye guhertin... Êdî xet, faşîzm û paşverûtiya Erdogan û demokrasî, maf û modernîtê ye.

Rastiyek dîrokî: Cîhan deyndarê şagirt û bawermendên Mesîh û Suryaniyan e. Îro jî, cîhana deyndarê Kurdan û Cenabê Ocalan e. Kurdan, bi paradîgmeya Ocalan, li hemberî çeteyên DAIŞê nirx û rûmeta mirovahiyê parastin.

Di sedsala bîstan de Hîtler gelên Ewropa li çarmixê dan; di sedsala bîstûyekê de Erdogan gelên li Kurdistan û Rojhilata Navîn li çarmixê dide. Hê jî, mirovahî bêdeng e, weytî cîhan!...



# Divê rêxistina jinên Êzidî bê xurtkirin

**4'ê Mijdarê li bajarê Elmanya Bielefeldê civîna berfireh ya Rêveberiya Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî (SMJÊ) hate li darxistin. Bi dehan nûnerên SMJÊ ji gelek herêman tevlî bûn. berdevka SMJÊ Nurê Alkiş bi rê ve bir. Alkiş diyar kir "Xebatên jinên Êzîdî sala 2018'an gelekî berhemên pîroz afirandine. Her wiha di civînê de hat diyar kirin ku ji bo dawî li qirkirina fîzîkî û çanda destavêtinê were anîn, rêxistinkirin were xurt kirin.**

Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî (SMJÊ) ji bo dawî li qirkirina fîzîkî û çanda destavêtinê were anîn, bal kişand ser girîngiya rêxistinbûnê.



4'ê Mijdarê li bajarê Elmanya Bielefeldê civîna berfireh ya Rêveberiya SMJÊ hate li darxistin. Bi dehan nûnerên SMJÊ ji herêma Berlîn, Saarbrucken, Achim, Celle, Leer, Heidelkreis, Wesel, Emmerich û Bielefeld tevlî bûn.

Civîn bi merasîma rêzgirtinê destpê kir û berdevka SMJÊ Nurê Alkiş bi rê ve bir. Alkiş diyar kir "Xebatên jinên Êzîdî sala 2018'an gelekî berhemên pîroz afirandine. Lê di asta jor de pêwîstî bi bilindkirina Têkoşîna Azadiyê heye. Divê em vê têkoşînê bi awayekî bê navber bidomînin."

Hevseroka NAV-YEK'ê Çîçek Yildiz di civînê de axivî û kuştina 2 jinên ciwan ku hefteyekê li 2 bajarên cuda pêk hatibûn, şermezar kir. Yildiz girîngiya perwerdekirina jinan a di warê hişmendî anî ziman û got, "Tenê bi rêxistinbûneke mezin a li dijî hişmendiya zayendperest û desthilatdar ku jin wek koleyê xwe dibîne, qirkirina fîzîkî û çanda destavêtinê dikare were rawestandin."

Nûnera TAJÊ Pelda Şengalî jî bal kişand ser polîtîkayên hêzên dagirker ku di kesayeta jinên Êzîdî de bi rêbazên cuda hewl dide vîna civakê tune bike. Şengalî bi bîr xist, "Êrîşa di kesayeta Mam Zekî Şengalî de pêk hatî nîşaneya berdewambûna fermanê bû. Divê rêxistina jinên Êzîdî bi lez û bez were xurtkirin û pêşiya fermanan were girtin."

Di civînê mijareke sereke jî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bû. Beşdarên civînê bi yekdengî biryara bilindkirina têkoşîna li dijî tecrîdê dan.

Civîn bi plansaziya sala 2019'an bi dawî bû. Cihekî berfireh ji têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê re hate veqetandin.

# Ji bo Rêber Apo her cihî veguherînin qada çalakiyan

TJK-E bi daxuyaniyekê diyar kir ku roj roja rabûna li ber êrîşên li dijî Rêber Apo ye, roja geşkirina têkoşînê ye.

Ji bo şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wê ji 6'ê vê mehê û pê ve li bajarê Strasboûrg ê Fransayê hin çalakî werin lidarxistin.

Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê (TJK-E) daxuyaniyeke nivîskî weşand û ji bo çalakiyan banga tevlîbûneke xurt hate kirin.

Daxuyaniya TJK-E'yê wiha ye: "Dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên ji bo qirkirina gelê Kurd didomîne. Armanca sereke ya van polîtîkayên qirkirina gelê Kurd, Rêber Apo ye. Tecrîd û êşkenceya giran ku weke dewama komployê kete dewrê û sê sal in bê navber dewam dike, nîşaneya berbiçav a vê rastiyê ye. 3 sal in têkiliya Rêber Apo ya bi derve re bi temamî qut bûye û bi tecrîdeke giran pêşî li hevdîtina bi malbatê û parêzeran re hatiye girtin. Li ser tenduristî, ewlekarî û jiyana wî ti agahî nîne. Bêdengiya CPT a li pêşberî rewşê û xemsariya wê nîşan dide ku saziyeke serbixwe nîne. Biryara dawî ya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) jî bi ti awayî li hiqûqê nayê û biryareke siyasî ye. Ev yek jî acîliyeta rewşê radixe pêş çavan. Ev yek eşkere ye; hêzên hegemonîk ji bo hebûna xwe bidomînin rejîmên faşîst xwedî kirine, saziyên xwe ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne û di nava komployan de komplo amade kirine.

Gelê Kurd ku gelekî qedîm ê Rojhilata Navîn e, lê di nava sîstema dewletên cîhanê de hebûn û nasnameya wan nehatiye qebûlkirin, bi pêşengiya Rêberê Gelê Rêber Apo zêdeyî 40 sal in têdikoşe û têkoşîna xwe ya li dijî van êrîşên qirkirinê bi rengekî serketî didomîne. Di serî de têkoşîna azadiyê ya jinê, di pêşketina şoreşgerî ya Rojhilata Navîn de bû pêşeng û nîşanî hemû gelên cîhanê da ku jiyaneke demokratîk û azadîparêz pêkan e.

Rêber Apo bi salan e li dijî van êrîşan bi rengekî bêhempa li ber xwe dide û timî me bi ser dixîne. Em bi biryar in ku li ser xeta berxwedanê ya Rêber Apo têkoşîna xwe geş bikin. Roj roja rabûna li ber êrîşên li dijî Rêber Apo ye, roja geşkirina têkoşînê ye. Ji ber vê yekê em bang li gelê xwe dikin ku heta tecrîd were rakirin û Rêber Apo azad bibe, her roj û her cihî veguherîne qada çalakiyan."

# Wê tekoşîna me serbikeve

Rêxistina HDP'ê ya Colemêrgê bi dirûşma "Em ê bi rêxistinê azad bibin" kongreya xwe li dar xist. Hêjmareke zêde parlementerên HDP'ê û nûnerên saziyan tevlî kongreyê bûn.

Di kongreyê de nameya Parlementera HDP`ê ya girtî Leyla Gûven ji aliyê endama meclîsa partiya DBP`ê Şehzade Kurt ve hat xwendin. Leyla diyar kir ku ew ê li hemberî êrîşan li her qadên jiyanê têkoşîna xwe bidomînin û wiha got: "Em wekî gelê kurd pêvajoyeke mezin derbas dikin. Di dírokê de îro em li dijî hemû êrîş û politikayên têkbirinê bi biryareke mezin li ber xwe didin. Li dijî êrîşan em ê têkoşîna azadiyê bilind bikin. Li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîd her roj giran dibe. Li hemberî politîkayên dîlgirtinê û komployên navneteweyî em ê bi rûmet têkoşîna xwe bidomînin. Bêguman têkoşîna me wê hêzên desthilatdar têk bibe û wê me ber bi serkeftina têkoşînê ve bibe. Li hemberî siyaseta me ya Demokratîk her roj êrîşên xwe zêde dikin em ê bi ser bikevîn û serkeftin a me ye. Ez rêveberiya nû pîroz dikim û ji wan re serkeftinê dixwazim."



# 'Sara' wê her bijî



Avesta AMARGÎ

Ez di şexsê Saraya bi çûk de, tevahî zarokên Kurdistanê, yên ku bûn qurbanê şerê dagirkerên li ser Kurdistanê û jiyana xwe ji dest dan bi rêzdarî bîrtînim û bejna xwe ditewînim. Ez li hemberî ew dilê wan yê dilpak, zêrîn, hezarî carî minetdariya xwe tînim ziman. Belê, me îro di rûpela dilê xwe de navê saraya biçûk nivîsand. Gelê Bakûrê Sûriyê, bedana saraya biçûk spartin dilê xwe, sond xwarin û bi yek dengî gotin; emê tola sarayan, bi misogerkirina jiyana azad ya ji bo pêşeroja zarokan hilînin.

Li Tirkiyê di dema Erdogan hatiye ser hikim û şûnde bi hezaran zarok li Kurdistanê, hatin qetil kirin. Di serî de li Bakûr, Başûr, Rojhilat û Rojava Erdogan bûye qatîlê zarokên Kurdistanê. Saraya biçûk yek ji wan qurbaniyan e. Hedef girtina zarokan ne tiştekî rast hatine, êrîşeke pir bi taybete. Erdogan, ji bo desthilatdariya xwe ji dest nede, her tiştî dike. Li hemberî hebûna Kurdên azad çavên xwe sor kiriye û her çar perçeyên Kurdistanê kiriye hedefa xwe. Hêj birîna Efrînê, di dilê tevahî Kurdan de gerime û wê qet neyê ji bîrkirin. Serdestê ku li Efrîn, Amed, binarên Qendîl û Girê Spî zarokan qetil dike xwediyê heman hişmendiyê ye. Hêzên serdest dema civakekê hedef digirin hêza sereke ya ji bo xwe dike hedef zarok û jinin. Gelê Kurd, tevî ku her carê bi berxwedanê dersek daye dewleta Tirk jî lê, her tim li Kurdistanê, êrîş kiriye û bi vê bawer kiriye wê bi qetilkirina zarokan encama dixweze bigire. Gelê Kurd, gelekî ji mirina xwe, xwe ji nûve diafirînê ye. Di nava netewekî de dema mirin bê mirin dibe û xwe bi wate bike ti êrîşa fîzîkî nikare wê heqîqetê ji holê rabike. Gelê Girê Spî, di dilên xwe de bi sonda afirandina bi hezaran sarayan dan êrişên dewleta Tirk yên hovane. Heqîqeta Sara, di felsefeya jiyana bê mirinî de hate neqişandin.

Dewleta Tirk, bi êrişên xweyî li ser şoreşa Rojava re ti ferqê nahêle di navbera xwe û çeteyên DAIŞ'ê de. Di demeke ku şervanên parastina Rojava dest bi pêngava şerê qedandina terorê kirine, êrişên dewleta Tirk yên li ser Rojava ne tiştekî rast hatiye. Dewleta Tirk pir vekirî dibêje; min bi çeteyan xwest ez vê pêla Kurdê azad bifetisînim lê wan nekarî em neçarim bi xwe bikevim dewrê. Êrîşa niha li Girê Spî, Kobanê û hwd têne li darxistin para vê hişmendiya dewleta tirke. Saraya bi çûk bû qurbanê vê hişmendiya faşîst û nijedperest.

Ya ku em esas lê vegerin û pirs bikin ev pirse. Gelo, li hemberî van kiryarên hovane yên dewleta Tirk, li ser şoreşa gelên Bakûrê Sûriyê pêk tîne dengê azadîxwazan çiqas bilinde.?

Di gelek deman de kiryarên dij mirovî yên dewleta Tirk, li ser gelê Kurd pêk hatine lê, her tim cîhan bê deng ma ye. Ev bê dengî ji bo Tirkan her tim bûye hêviyek ji bo pêkanîna êrîşan. Her kurdek pêwîste ji xwe vê pirsê bike; Gelo, çima dema mijar dibe kurd û Kurdistan cîhan, Rola 3 maymonan dileyîze.

# Ber bi tifaqa Êzidiyan ve gaveke girîng

**Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê ji bo tifaqa Êzidiyan pêk bîne û xwe bixwe birêve bibe, civîneke girîng li Şengalê lidarxist. Di civînê de, di mijara tifaqa navbera Êzidiyan, xwe bi xwe birêvebirina civaka Şengalê de gelek biryarên girîng hatin girtin. Di dawiya civînê de daxuyaniyek hat dayîn û bang li hikûmeta Iraqê û hikûmeta Başûrê Kurdistanê hat kirin rêzê bidin îradeya gelê Êzîdî.**

Siyasetmedarên Bakurê Sûriyê diyar kirin ku Tirkiye bi armanca ku aloziya xwe ya hindirîn derbasî derve bike û temenê DAIŞ'ê dirêj bike êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê dike.



Nerazîbûna li hemberî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser herêmên Bakurê Sûriyê û hedefkirina sivîlan her diçe zêde dibe.
Rêveberê Partiya Sûriya Pêşerojê ya Buroya Hesekê Ehmed Esed diyar kir armanca êrîşên Tirkiyê yên li ser Kobanê û Girê Spî ew e ku aramiya herêmê têk bibe û temenê DAIŞ'ê a ku li Dêrazorê nefesa xwe ya dawî dide dirêj bike.
Esed destnîşan kir ku Tirkiyê ji projeya demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ditirse lewra jî êrîş dike. Esed da zanîn ku Tirkiye bi êrîşan hewl dide tevliheviyê di navbera gelên herêmê de derxîne û temenê DAIŞ'ê drêj bike.
Ehmed Esed derbarê civîna çar alî ya ku li Stenbolê hat lidarxistin jî destnîşan kir ku ev civîn ji bo Tirkiyê bi fêde bû û wiha got, "ji ber ku Elmanya û Fransa di mijara penaberan de ditirsin û Tirkiye jî bi rêya koçberan gefê li wan dixwe. Têkiliyên Tirkiyê û Rûsyayê jî xweş in, ji ber Rûsyayê rê da ku Tirkiye Efrînê dagir bike."
Esed Koalîsyona Navdewletî ji êrîşên Tirkiyê yên li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê berpirsyar girt û destnîşan kir ku hebûna DAIŞ'ê li ser tevahî gelê herêmê xeteriyeke mezin e.
Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê Fethullah Hiso jî derbarê mijarê de got: "Ya balkêş e, her ku hêzên leşkerî li dijî DAIŞ'ê operasyon dide destpêkirin, Tirkiyê bi hemû rê û rêbazan hewl dide vê pêngavê asteng bike û wiha got, ji ber ku Tirkiye DAIŞ'ê wekî amûrekê bi kar tîne da ku projeya demokratîk a Bakurê Sûriyê têk bibe. Di heman demê de hewl dide bala cîhanê li ser aloziya hindirîn a Tirkiyê bibe."...*ANHA*

## Pêwîste Kongreya Netewî bê lidarxistin





Endamê rêveberiya YNK'ê Aras Abdula û Parlamenterê Tevgera Goran diyarkirin ku divê kongreya netewî were li dar xistin û stratejiyek netewî a hevbeş were danîn.
Herwiha dan zanîn ku ji dagirkirina Efrînê diyar bûye ku dijminê gelê Kurd yekin.
Hewldanên Kongreya Netewî ya Kurdistan (KNK) yên ji bo pêkanîna kongreya netewî berdewam dikin. Li ser vê mijarê Endamê rêveberiya YNK'ê Aras Abdula diyar kir ku divê dezgeyek nîştimanî û netewî ji bo gelê Kurd bê ava kirin û wiha axivî: "Divê dezgehek siyasî û rewşenbîrî hebe, ev jî ji bo fikir û helwesta siyasiyên Kurdistanê be. Divê ev dezgeh pêşxistina doza gelê Kurd, taybetmendiyên beşên Kurdistan û dewletan li ber çavan bigre. Bi vê re hê zêdetir ji bo nasandina pirsgirêka gelê Kurd hewldan bên kirin û piştgirî bê peyda kirin. Hewldana ji bo komkirina hemû hêz, alî û stratejiyek zelal gelek girînge. Ger hinek alî jî tevlî kongreyê nebin, karek asayiye. Lê divê ne aliyên bi bandor bin, hewldan ji bo vê yekê berdewam dikin. Ez hêvîdarim li hev kirinek ji bo stratejiyek nîştimanî û netewî pêk bê."
Di dawiyê de Aras Abdula li ser piştgiriya hizba wan ya ji bo pêkanîna kongreya netewî got; "Me di destpêkê de piştgiriya kongreya netewî kiriye û em pêre bûn. Em beşdarî konferas û kongreya KNK'ê jî bûn. Li gorî me pêkanîna vê kongreyê gelek girînge, lê bi mercê ku hizba parçeyekê dest ne avêje kar û barê parçeyên din yên Kurdistanê. Wek mînak em piştgiriya şoreşa Rojavayê Kurdistanê dikin, lê hinek hizb hene dikevin nav kar û barên wê parçeyê de û astengiyan ji bo wê parçeyê çêdike. Ev jî ne karek rewaye."
Parlamenterê Tevgera Goran Şêrko Hemeemîn jî li ser heman mijarê axivî û got: "Pêkanîna kongreya netewî pêwîste û gelek direng jî maye. Ji ber ku di mijara dagirkirina Efrîn û hatina çeteyên DAIŞ de, diyar bu ku dijminên Kurd hevbeşin. Ji bo vê pêwîste kongreya netewî pêkbê û stratejiyek netewî û hevbeş bê danîn.
Endamê Tevgera Goran di Konseya Rêveber a KNK'ê de cihê xwe digre, herwiha Tevgera Goran hertim piştgiriya siyasetek nîştimanî û netewî dike. Divê peywendiyên Herêma Kurdistan bi derve re, di berjewendiyên bilind yên gelê me de be."...*ROJNEWS*

## Tirkiye bi hêza civîna Stenbolê êrîşî Rojava dike




HDK'ê encamnameya Civîna Meclîsa Giştî bi raya giştî re parve kir. HDK'ê di encamnameyê de diyar kir ku Tirkiye bi hêza ji civîna çar alî girtiye êrîşî Rojava dike. HDK'ê bertek nîşanî erîşan da û got: "AKP îdia dike ku bi armanca rizgarkirina sivîlan Idlib dagir kiriye û li aliye din bi hêza ji civînê girtiye êrîşî Rojava dike."
Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK), encamnameya Civîna Meclîsa Giştî ya 6'emin a Serdema 8'emîn ku di 5'ê mehê de pêk anî bi raya giştî re parve kir. HDK'ê di civînê de bal kişand ser zextên li ser HDP'ê û kesên muxalif û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan.
Encamnameya HDK'ê wiha ye:
"* Meclîsa Giştî ya HDK'ê di 4'ê mijdarê salvegera darbeya siyasî de kom bû. AKP'ê pêvajoya hevdîtinan a rê li pêş aştiyê veke, bi dawi kir û bi tunehesibandina Mutabakata Dolmabahçe dîsa rê li pêş pêvajoya şer vekiriye. Piştî AKP'ê ev darbe dest pê kir, Hevserokên HDP'ê, wekil, hevşaredar û endamên meclîsê yên HDP'ê jî di navde bi hezaran endam û rêveberên HDP û DBP'ê dîl hatin girtin. Ev serdem bi tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê ji bo serdema aştiyê pêvajoya diyalog û muzakereyan dabû destpêkirin, dest pê kir. Piştî tecrîdê hewldana 15'ê Tîrmehê pêş xistin û bi darbeya 4'ê mijdarê berdewam kirin. Bi vê yekê polîtikayên tundî û şer xistin meriyetê û berdewam kirin. HDK, dê li dijî van hemû polîtikayên tundiyê têkoşîna xwe bilind bike.

### LI DIJÎ POLÎTÎKAYÊN TUNDIYÊ TÊKOŞÎN

* Îktîdara AKP'ê mafê heyî yê jinan tev ji destê wan girtiye. Dixwazin rê li pêş rêxistinbûna jinan bigirin. Ev polîtîkayên tirpankirina mafê jinê didome. Zêdeyî 60 aktivîstên TJA hatin binçavkirin û bi dehan hatin girtin. Ev li dijî têkoşîna wekhev û azadiyê ya jinan êrîşek e. Dîsa nefeqeya jinên ku hevjînên xwe berdan bi 5 salan bi sînor dike û dixwazin dîsa jinan muhtacî mêr bikin. Navenda me ya Jinan dê di 25'ê mijdarê de li dijî tundiyê têbikoşe. Dê li dijî tundiyê têkoşînê bilind bike.

### BERXWEDANA KOBANÊ BÛ SEMBOL

* Meclisa me ya Giştî bal kişand ser 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanê û diyar kir ku Kobanê bûye sembol û nirxên neteweyî ava kiriye.

### ROJAVA NE GEF E

* Meclîsa me ya Giştî diyar kir ku Tirkiye bi hêza ji zîrveya çar alî girtiye êrîşî Rojava dike. HDK'ê bertek nîşanî erîşan da û got: "AKP îdia dike ku bi armanca rizgarkirina sivîlan Idlib dagir kiriye û li aliye din bi hêza ji civînê girtiye êrîşî Rojava dike."

## Bi hêza xwe bawer kirin



Qasim ENGÎN

Dewleta tirk dîn û har bûye. Bi nexweşîya netewperestî û olperestî çavên xwe tarî bûne. Ji ber vê, çawa ku gayê Spanî rengê sor dibîne û êrîş dike bi heman rengî dewleta tirk jî li ku derê deskeftiyek Kurdan dibîne êriş dibe ser.
Lê em bizanin ku êrîşa tirkan ne ji ber xûrt bûyîna wan e. Berovajî, ewqas erîşên bê hesab ji ber tirsa mirinê ye. Bi gotinên wan, Tirkiye di rewşeke mirin û mayînê de ye. Hê şenbertir, rewş "Ya İstîklal ya Mirin e." Çiqas û çendî ev raste, ew mijarek din e, lê hêzên nijadperest û olperest bi vê bawerin.
Çendî ev rast be jî, mijarên ji van girantir û girîngtir hene. Di serî de rejîma niha ya Tirkiyê gelek sûcên mirovahî kirin e. Ewqasi komkujî pêkanîne. Ewqasî piştgiriya DAİŞ ê kirine, teror ixraca derve kirine. Bi dehan mirovên sivîl qetilkirin e. Her wiha li Tirkiyê bi xwe hezaran sûc kirine. Mirov dane girtin, kuştin, destdanîne ser mal û warê wan û mişext kirine. Mirov di bin jêr zemînan de şewitandine. Tirbên wan rûxandine, bombebaran kirine. Dayîk li kolanan bi hedef qetilkirine. Zarok di bin tekerên polîsan de hêştine. Bi hezaran sed hezaran çete, ixwanî xwedî kirine, bi çek kirine û bi destên wan êrîş birine ser bajarên Suriyê û Suriye talankirine.
Bê guman kirinên wan yên sûc tenê ev nînin. Gelek zêde ne. Tenê di 15'ê Tîrmehê de çi kirine ji bo ku werin darizandin bese. Ji ber ku herkesî di ekranan de dîtiye ku hevalên Erdoxan û Erdoxan çi kirine û çi nekirine.
Em dirêj nakin û dibêjin, erîşên Erdoxan û hevalbendên wi yên li ser Rojava û Bakurê Sûriyê ne ji pir xurtbûna wan e. Na, ji ber ku ditirsin êrîş dikin. Encex bi êrîşan dikarin hêzên netewperest û olperest mobîlîze bikin û wek gayê Spanî daxin kolanan. Encex bi erîşên sexte dikarin dizî û talanên xwe veşêrin. Encex bi êrîşan dikarin li ser piyan bimînin.
Lê em bizanin ku feydeya tirsê ji ecel re nîne. Wexta ku dem hatibe yê ku biçe wê biçe, yê ku bimîne jî wê bimîne. Êdi dem hatiye ku Erdoxan û rejîma xwe ya xwinxar û diz biçe. Ger tekoşînek bi vînek mezin li hember êrîşên derveyi mirovî û hovane were raber kirin, êdi ne tu kes ne jî tu tişt dikare Erdoxan û hevalbendên wi yên diz xelas bike.
Bi gotinên hê zelaltir, ger li Rojava û Bakûre Suriyê g Kurd, Ereb, Tirkmen, Sûryani-Keldani-Asûri û her wiha Çerkez, Ermen li hember faşizma Erdoxan berxwedanek bêhempa nîşan bidin, çûyina Erdoxan û şirîkên wi teqez e.
Ji ber ku Erdoxan vê rastiyê dizane ewqasi dîn û har bûye. Sedema ewqas êrîşên mezin li ser Rojava û Bakûre Sûriyê ev e.
A girîng ew e ku, gelê Rojava û Bakûre Suriyê nîşan bidin ku dikarin ji bo azadi û rûmeta xwe her tiştên xwe feda bikin. Roja ku ev vîn were raber kirin, roja din Erdoxan wê bibe Ruh-ul Qudûs.



# Em ê rê nedin planên qirêj yên Tirkiyê

**Nerazîbûnên li dijî êrîşên dewleta Tirk ya dagirker a li dijî Bakurê Sûriyê zêde dibin. Welatiyên Efrîn û Şehbayê êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Kobanê û Girê Spî şermezar kirin û diyar kirin ku bi ruhê Berxwedana Serdemê ew ê hemû êrîş û planên qirêj yên dewleta Tirk werin pûç kirin.**











Ikbal BEDRAN

Gelê Efrînê yê di encama êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk de di 18 Adara 2018an de bi zorê koçberî Şehbayê bûye, êrîşên dewleta dagirker ên bi ser herdu kantonên Kobanê û Girê Spî ve şermezar kir. Şêniyên Efrîn û Şehbayê tekez kirin ku ew ê rê nedin Tirkiyê planên xwe yên têkbirina îradeya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê avabûye, pêk werin. Gelên Efrîn û Şehbayê tekez kirin; wê bi ruhê Berxwdana Serdemê hemû hewldanên faşîzma Tirk ên qirkirina gelan bê wate bimînin.

### KURD XWEDÎ ÎRADEYA NEMIR IN

Welatiyê bi navê Ciwan Nasan di çalakiya şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk ên bi ser gundên Kobanê û taxên sivîlan ên Girê Spî de got: Çiqas cureyên êriş û dagirkeriyan hene, naşibin yên Tirkiyê. Tirkiyê di şexsê Erdogan de şerê etnesîteyan dike. Çi destkeftiya Kurdan hebe, li Afrîqayayê be jî êriş dike. Di cewher de Tirkiyê qirkirina Kurdan û gelên dîtir hedef digire. Nasan destnîşan kir ku; êrîşên faşîzma Tirk ên bi ser Kobanê û Girê Spî ve dewama êrişên bi ser Efrînê ve ne.
Nasan di nav axaftina xwe de got: Erdogan difikire dewleta xwe ya yekrengî bi qirkirina gelên eresen ava bike. Wer lê hatiye ku her li ser tunebûna gelên dîtir mezin bûye. Nasan dawiyê de tekez kir: Tirkiyê çi dike bila bike, nikare qira Kurdan bîne. Kurdên îro xwedî felesefeya jiyanê ne. Êdî gelekî nemir hatiye afirandin. Dîrok jî vê yekê piştrast dike.

### HER KAREK SEKNEK E

Ji aliyê xwe ve nişteciyê Kampa Berxwedan Îbrahîm Moşêl got: Dewleta Tirk ji bo hinek bazariyan dixwaze li aliyê Kobanê û Girê Spî tevliheviyan derxîne. Moşêl ji çarçoveya berxwedana Efrînê ji gelên Herêma Federal a Firatê re got: Ji bo ku planên Erdogan li Kobnê û Girê Spî têk biçin, pîwste gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê destê xwe bi hev din. Her ferdekî civakê çi karî bike seknekî berxwednê ye. Moşêl dawiyê de got: Faşîzma Tirk li Efrînê derbên giran dixwe. Dixwaze bi van êrişan şikestina xwe li Efrînê binixumîne.

### DESTEKCIYAN TEŞHÎR BIKIN!

Şêniyê bi navê Mihemed Sebrî destnîşan kir ku dewleta Tirk piştî Efrînê hêvî dike mudexeleyî herêmên dîtir ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike û ev tişt anî ziman: Dewama aloziya li Sûriyê di feydeya Tirkiyê de ye. Li hemberî hêzên demokrasiyê çeteyan bikar tîne. Sebrî diyar kir: Eger ji destê wê werê tişta li Efrînê kiriye wê li Kobanê, Girê Spî û her devera Sûriyê bike. Seberî bal kişand ser kesên hindirîn ku destek didin dagirkeriyê û got: Armanca Tirkiyê tenê talanî ye. Pêwîste gelê me kesên ku destek didin dagirkeriyê teşhîr bike.

### ÎRADEYA GELAN WÊ BI SER KEVE

Arîf Sîdo Endamê partiya PYD di vê babetê de nerîna xwe wisa anî ziman: Êriş û helwestên navneteweyî eşkere dikin ku gelê Kurd li beramberî şerekî topyekûn e. Wer xuyaye hêzên mêtinger êdî li hemberî projeya gelan a demokratîk têk çûne. Ji ber vê jî asta êrişên xwe bilind kirine. Sîdo dewam kir: Faşîzma Tirk hewl dide bi derûniya dagirkirina Efrînê berxwedana di dewrê de bitepisîne. Bi heman rêbazê dixwaze aliyê Kobanê û Girê Spî jî dagir bike. Sîdo di dawiyê de ev tişt anî ziman: Çawa îradeya gelan di şexsê Berxwedana Serdemê de bi ser ket, wê li Kobanê, Girê Spî û her devera dagirkerî lê hebe bi ser keve.

### EW JÎ ŞIRÎKÊ SÛC IN!

Mamoste Welîd Bekir jî got: Ji ber tengavbûna dewleta Tirk êrîşî gelan dike. Erdogan dixwaze bi van êrişan çetetiya xwe binixumîne. Bekir dewam kir: Pêwîste hemû aştîxwazên dunyayê li kêleka têkoşîna gelê Kurd a aştiyane bisekine. Dewleta Tirk terorê xwedî dike. Mamoste Bekir dawiyê de helwesta navneteweyî li hemberî êrîşên dewleta Tirk ên bi ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve şermezar kir û got: Pêwîste aliyên ku çavên xwe li ser terora Erdogan digirin baş zanibin ku ew jî şirîkê sûc in. Gelên Sûriyê ji bilî jiyaneke azad ti jiyaneke din hilnabijêrin.

## Armanc ji kuştina El-Hiwêdî derxistina fitnê ye



El-Efadlê Beşîr Feysel El-Hiwêdî re hate xwestin û soza şopandina riya şehîdan di avakirina Sûriyeke demokratîk de hate dubarekirin.

Eşîrên El-Sebxa û El-Bosbêh ên Reqayê derbarê kuştina şêxê eşîra El-Efadlê Beşîr Feysel El-Hiwêdî de daxuyaniyek dan û diyar kirin ku daxuyaniyên hin aliyan ku dijberiya gelê herêmê dikin hatine dayîn nûnertiya welatiyên herêmê nakin û dûrî nirx û exlaqa eşîrtî ne.
Şêx û rûspiyên her du eşîrên El-Sebxa û El-Bosbêh ên Reqayê li Navenda Têkliyên Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) kom bûn û derbarê kuştina şêxê eşîra El-Efadlê Beşîr Feysel El-Hiwêdî de daxuyaniyek dan. Daxuyanî ji aliyê şêxê eşîra El-Sebxa Mihemed Turkî El-Sûan ve hate xwendin.
Di destpêka daxuyaniyê de sersaxî ji malbata şêxê eşîra El-Efadlê Beşîr Feysel El-Hiwêdî re hate xwestin û ev sûcdariya li dijî wî bi tundî hate şermezar kirin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku armanc ji van kiryarên bi vî rengî ew e ku aramî û ewlehiya li Reqayê têk bibin ku bi saya fedekariya şervanên QSD'ê û ciwanên Reqayê hatiye avakirin.
Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em weke welatiyên her du eşîrên Reqayê l-Sebxa û El-Bosbêh em dibînin ku ev helwestên li ser malperên civakî tên weşandin ên ji aliyê hin kesên ku dixwazin tevliheviyan di navbera welatiyên herêm de derbixînin, ti carî nûnertiya welatiyên herêm nakin û ti girêdana wan bi exlaqên eşîrtî re tune ne."
Di dawiya daxuyaniyê de careke din sersaxî ji malbata şêxê eşîra

## Zilma zalimên weke Erdogan wê bi berxwedanê têk biçe



Zekî BEDRAN

Dewleta Tirk êrîşên xwe yên li ser Sûriyê zêde kir. Berjewendîparêziya Rûsyayê ya ku îflah nabe bi pêşkêşkirina Efrînê ji Tirkiyê re Sûriye ji êrîşan re vekir. Tirkiye nikare bi serê xwe vê bêperwatiyê bike. Rûsyayê qada hewayî vekir. Niha jî bi dewleta Tirkre hevpariyê didomîne. Li şûna ku qada hewayî bigire xwe dispêre hevrikiya bi DYE'yê re Tirkan ji bo êrîşan teşwîq dike. Qaşo li Îdlibê ketibûn nava fikarên mirovî. Êdî dema çareseriya siyasî hatibû. Lê Tirkiyê bi awayekî eşkere gef li Bakurê Sûriyê xwar. Her roj dibêje ku wê êrîş bike. Rûsya qet li ber vê yekê ranabe. Nabêje, "ka agirbesta mayînde û çareseriya siyasî."
Heman hevnegirtin ji bo welatên Ewrûpayê jî derbasdar e. Merkel û Macron li Stenbolê li rex Erdogan rûniştin. Ew jî nabêjin ev êrişkarî ji bo çiye. Qaşo çareseriya siyasî dixwestin û digotin, bila şer bi dawî bibe. Ji ber Erdogan vê rewşa wan ya berjewendîperest û hevnegirtî dizane êrîşên li dijî sînorên Sûriyê destpê kir. Bi van êrîşan bertekên wan dipîve û helwesta wan diceribîne. Lê weke ku tê dîtin ji Rûsya û Ewropa deng dernayê. Erdogan jî ji vê yekê cesaret girt û planên xwe yên şer xiste meriyetê. Piştî êrîşên li ser Kobanê gotubû, wan dest bi operasyonan kirine û ew ê vê dorfireh bikin. Niha jî bermahiyên çeteyan ji Îdlib û Efrînê dibe ser sînorê Bakurê Sûriyê. Li şûna leşkerên xwe ew ê van çeteyan bajon pêş. Tirkiyê di şerê taybet û qirêj de tecrube bi dest xistiye. Ew ê hem li şûna leşkerên xwe van çeteyan bajo mirinê û hem jî wê ji cîhanê re propagandayê bike û bêje hêzên Sûriyê ji bo vegerin welatê xwe şer dikin û bi vî rengî hinek be jî wê hewl bide li ser dagirkerî û dijmintiya xwe ya li Kurdan bigre.
Erdogan serî li ber DYE'yê jî radike. Lewma Îran û Rûsya jixwe dijmintiyê li DYE'yê dikin. Xwe dispêre van hêzan, hewl dide Emerîkayê bêzar bike û gav paşde pê bide avêtin. Erdogan xwest xwe bi cem Emerîka lê Emerîka têkiliyên xwe bi Kurdan re qut nekir. Ji ber vê niha hewl dide krîzê kûr bike û Emerîkayê li hêrêmê tengav bike. Li hember vê yekê helwesta Emerîkayê zêde zelal nîne û berteka wan jî gelek qels e. Emerîka li hinek noqteyên li ser sînor bi hêzên QSD'ê re dewriyeyên hevpar dike. Lê ev bertek têrê nake ku gav bi Tirkiyê paşde bide avêtin. Erdogan ji ber helwesta Rûsyayê êdî bû hevparê Sûriyê. Hem hêzên wan yên dagirkirinê hene û hem jî piştevaniyê ji deh hezaran hêzên çekdar yên ku şer dikin re, dike. Ew di bin sîwanê xwe de komkiriye û li wan xwedî derdikeve. Piştgiriya çek û lojîstîkê dide. Di qada navnetewî de wan diparêze û nûneriya wan dike. Van hêzan wê îro li dijî Kurdan û Gelên Bakurê Sûriyê bikarbînin. Sibê jî wê li dijî rêjîmê û hêzên din yên ku naxwazin bikarbînin. Ya herî hêsan jî ew e ku li dijî Rûsyayê bikarbînin. Lewra dema ji van hêzan û yên di bin bandora wan de ne were gotin, Rûs kafirin û bila ji Sûriyê derkevin, wê Rûsya çi bike? Rêjîm ewqas xwedî hêz nîne ku Rûsyayê biparêze.
Rûsya qaşo dixwaze Erdogan li dijî DYE û NATO'yê bikarbîne. Dijmintiya Tirkiyê ya li Kurdan jî bikartîne û hewl dide jê sûdê destbixe. Di dem kurtî de dibe ku hinek avantajan bidest bixe lê dem dirêjî ew ê Rûsya berdêlên giran bide. Tirkiye wê di dawiyê de rêyên xwe ji NATO û DYE'yê bi temamî veneqetîne. Heman tişt ji bo Îranê jî derbasdare. Îran jî bi sorkirina dijmintiya li Kurdan dikare Tirkiyê çiqasî li dijî DYE'yê bikarbîne? Bi van taktîkên demkî û bê feyde pirsgirêka Sûriyê çareser nabe. Wê hê zêde bibe sedema mirinan, bêbaweriya di navbera gelan û çavkaniyan tune bike.
Divê rêveberiya Esed pişta xwe bi van lîstikên qirêj ve girê nede. Yek ji dewletên sereke ku Sûriye xistin nava gerîneka xwînê Tirkiye bû. Hê jî dest ji dagirkerî, dijmintî û wêrankirinê bernedaye. Divê Esed bikeve nava lêgerînê ku Sûriyê ji van lîstikên bi xwînî rizgar bike. Divê bi Hêzên Bakurê Sûriyê re ku nûneriya beşek esasî ya welat dikin, li ser bingeheke demokratîk rêya çareseriyê û yekîtiyê bigere. Ger ev yek bê biserxistin wê zêde derfetên destwerdana hêzên derve nemîne. Wê qada Tirkiyê û çeteyên wî jî teng bibe. Sûrîye wê nefesê bistîne û bi dawî anîn dagirkeriyê wê hêsan bibe.
Ji bo Bakurê Sûriyê tevlihev bikin û bingeha dagirkirinê ava bikin di serî de Tirkiye hinek hêzan lez dane xebatên xwe. Berî çend rojan li Reqayê serokê eşîrekê hat qetilkirin. Ji bo sabotajan û sûîqastan ji mêj de ferman hatibû dayîn. Gel û rêveberî neçar in hê zêde hesas û bi baldar bin. Tê xwestin ku rêveberî bê qelskirin û rewşa ewlehî û bi îstîkrar bê xera kirin. Divê gelên Sûriyê bibin yek, di eksena berxwedanê de axa xwe û destketiyên xwe biparêzin. Rewş cidî ye û nikare bê îhmal kirin. Tirkiye wê hewl bide êrîş bike û dagirkeriyê berfireh bike. Yekemîn sekna ku dagirkeran rawestîne welatparêzî û berxwedane. Divê berxwedan di her alî de were bi rêxistinkirin.